www.hevilgbti.org

# Pirsên Ku Timî Di Qada Hiqûqî de ji bo Penaberên LGBTÎ`yan Tên Pirsîn

EUROPEAN ENDOWMENT FOR DEMOCRACY

HÊVÎ LGBTÎ

# PİRSÊN KU TİMÎ Dİ QADA HİQÛQÎ DE Jİ BO PENABERÊN LGBTÎ`YAN TÊN PİRSÎN

**Amadekirin**
Yağumur Birdal

**Sêwirandin û Tîpsazkirin**
Zafer Rıfat Irmak

Ev pirtûk ji navbeynkariya Rêxistina Bexşê ya Demokrasiyê ya Ewropayê ve hatiye amadekirin. Berpirsiyariya naverokê bi tevahî girêdayî Komeleya HEVÎ LGBTI+ ye û nêrînên Rêxistina Bexşê ya Ewropî ji bo Demokrasiyê nîşan nade.

## 1 ÇİMA HİN BAJAR Jİ QEYDKİRİNÊ RE TÊNE GİRTİN? POLÎTÎQAYA KÊMKİRİNÊ Çİ YE?

Bajarên ku ji hêla Midûriyeta Giştî ya Rêvebiriya Koçberiyê ve hatine destnîşankirin û ku serlêder hewce ye ku lê bijîn, jê re bajarên satelîtê têne gotin. Guhêrbarîya van bajaran ji ber koçberiya zêde ya Tirkiyeyê û kapasîteyên bi sînor ew bajaran ve tê jiyîn. Di çarçoveya plana "Têkoşîna li gurbûna mekan" de, li hin taxan ji bo parastina pêkhateya demografîk rêjeya nifûsa biyanî bi nifûsa taxan re hat sînorkirin û di dema zêdebûnê de ji qeydên nû re hatine girtin. Ji bo ku hûn der barê bajar û taxên ku ji bo qeydkirinê re hatine girtin agahdarî bistînin, hûn dikarin li ser malpera Midûriyeta Îdareya Koçê an jî bi rêya Yimer 157 xwwe dikarin bigihîjinin agahiyên rojane. Her weha hûn dikarin ji nifûsa sîvîl a navçeya ku hûn dixwazin qeyd bikin, agahiyên rast bistînin. Ji bo ku di van pêvajoyan de gavên rast werin avêtin, girîng e ku mirov xwe bigihîne agahiyên rojane û dema ku hewce bike wergirtina piştgirîya qanûnî jî girînge.

## 2 EZ HATİM ŞANDİN BAJAREKÎ KU Jİ BİLÎ BAJARÊ KU EZ LÊ QEYDKİRÎ BÛM, EZ DİKARİM Çİ BİKİM?

Di vê rewşê de, du rêyên qanûnî gengaz in. Pêşî, divê ku hûn biçin bajarê ku hûn lê hatine şandin û navnîşana rûniştina xwe diyar bikin. Pişt re, divê ku hûn biçin rêveberiya koçberiyê ya bajarê ku hûn lê hatine şandin navnîşana xwe ya nû bidin û pêvajoya qeydkirina xwe temam bikin. Pişt re, divê ku hûn daxwaza xwe ya şandinê bikin li bajarê ku hûn cara yekem lê hatine qeyd kirin.

Rêyekî din jî ew e ku hûn dikarin di derbarê pêvajoya şandinê xwe de doz vekin. Hûn dikarin di doza têkildar de daxwaza rawestandina birêvebirinê bikin û daxwaz bikin ku hûn li bajarê xwe bimînin heya ku doza we bi dawî bibe. Her çendî ku dema dozê dirêj bibe jî, ji têkildarî biryara dadgehê ya derbarê daxwaza we ya rawestandina birêvebirinê de, ango hûn ê li bajarê ku hûn lê qeydkirî bimînin, dikare zû were dayîn. Lêbelê, girîng e ku hûn di vê pêvajoyê de piştgiriya parêzerek bigirin. Nexwe, dibe ku hûn bi hinceta ne pêkanîna heyama ku li kaxiza şandinê de hatiye diyar kirin de bi pirsgirêkan re rû bi rû bibînin.

## 3 SERLÊDANA MİN A PARASTİNA DEMÎ / PARASTİNA NAVNETEWÎ HAT QEBÛLKİRİN, GELO EZ DİKARİM BAJAR/PARÊZGEHA KU EZ TÊ DE QEYDKİRÎ ME BİGUHERİM?

Hûn dikarin daxwaz bikin ku hûn ji bajarê ku hûn lê qeydkirî ne barbikin bajarekî din a ku hûn bi endamekî malbatê yê ku li bajarekî  din a Tirkiyê rûdine re werin cem hev, dîsa hûn dikarin bi hinceta xizmetên tenduristî û perwerdehiyê sûd werbigirin an jî ji ber xebatê daxwaza barkirinê bikin. Divê ku hûn ew  daxwaza xwe pêşkêşî Midûriyeta Bajarê ya Rêveberiya Koçberiyê ya li bajarê ku hûn lê qeydkirî ne, bikin. Rayedarên şareza dê daxwaza we binirxînin û bersivek erênî an neyînî bidin we. Kesên ku bersiva erênî werdigirin divê ku biçin Midûriyeta Îdareya Koçê ya Bajarê û belgenaşme ya destûra rê bistînin. Bi vê belgename ya destûra rêwîtiyê ya 15 rojan ve, hewceye ku hûn biçin Midûriyeta Bajarê ya Birêvebiriya Koçberiyê re agahdarî bikin. Di dema vê agahdarkirinê de, divê ku li gel we belgename ya destûra we ya rê û belgeyên ku navnîşana we ya nû piştrast dike, an jî wek fatûreyek an peymanekî kirê hebe.

## 4 EZ Dİ BİN PARASTİNA DEMÎ / PARASTİNA NAVNETEWEYÎ DE ME, EZ ÇAWA DİKARİM Jİ XİZMETÊN TENDURİSTİYÊ SÛD WERBİGİRİM?

Xwediyên nasnameya parastina demî/parastina navneteweyî dikarin ji xizmetên li nexweşxaneyên giştî yên di nav sînorên bajarê ku lê dijîn sûd werbigirin. Ji xizmetên tenduristiyê yên bingehîn û lezgîn, li beregeha  ew tedawî û dermanên de heqê wan û rêje yên ku ji hêla Wezareta Tenduristî ya Komara Tirkiyeyê ve hatiye diyar kirin mirov dikare heqê beşdarbûnê bigire. Kesên ku dixwazin li nexweşxaneyên zanîngehan de derman bibin, dikarin bi destgirtina belgenameya şandinê ve derman bibin.

## 5 SÎGORTE YA MİN A TENDURİSTİYÊ YA GİŞTÎ PİŞTÎ SALEKÊ HAT GİRTİN, EZ DİKARİM DÎSA DEST Bİ SÎGORTEYA XWE BİKİM?

Li Tirkiyeyê sîgorteya tenduristiyê ya giştî ya serlêderên parastina navneteweyî û xwediyê statuya ji 18 salî mezintir ku salek ji roja qeydkirinê derbaz bûye, bi dawî dibe. Ji ber wê sedemê kesên ku temenê xwe li jorê 18`an û li bin parezgeha nawnetewî û xwediyê statû ne xwediyê sîgorteya tenduristiyê ne, nikarin pere bidin û hewcedariyên wan ên taybetî hene ger bi belgenameyên ku rewşa wan a hewcedariyê nîşân didin ve serî li Midûriyeta Rêveberiya Koçberiyê ya Bajarê bidin ku, sîgorteya wan a tenduristiyê ya giştî dikare bê sînorek salek berdewam bike.

Kesê ku di Xala 1/1 ya YUKK de xwedî hewcedariyên taybetî ye: Serlêder û kesên xwedî statuya parastina navneteweyî; Ew wekî zarokek bêkes, astengdar, pîr, ducanî, dayikek an bavê tenê bi zarokek, an kesê ku rastî îşkence, destdirêjiya seksî an tundûtûjiya giran a derûnî, laşî û zayendî hatibe tê pênase kirin. Kesên ku bi HIV-ê hatine teşhîs kirin, têne hesibandin ku hewceyên taybetî hene. Ji kerema xwe bi saziyên sivîl ên têkildar re têkilî daynin da ku agahdariya berfireh bistînin.

## 6 EZ Dİ BİN PARASTİNA DEMÎ/PARASTİNA NAVNETEWEYÎ DE ME, EZ DİKARİM KAR BİKİM?

Piştî 6 mehên ku ji roja derketina belgeya nasnameya parastina demî/parastina navneteweyî, ji ber destûra xebat an jî mûafiyeta destûra xebatê dikare serlêdan ji Wezareta Malbat û Xizmetên Civakî ya Komara Tirkiyeyê re were kirin.

## 7 EZ XWE DİKARİM Bİ HEVJÎNÊ XWE RE Lİ HEMAN BAJARÎ DE QEYD BİKİM?

Ger hatina we ya Tirkiyeyê û hevjîna we di heman demê de û  di heman dîrokê de be bi îhtîmalek mezin heye ku hûn li heman bajarî qeyd bibin. Lê belê li Tirkiyeyê di çarçoveya hiqûqî de pevretî ne statuyek e, ji ber vê yekê ger hevjînê we beriya we hatibe û qeyda xwe kiribe, ji ber hincetên weke hevgirtina malbatê hûn nikarin rasterast li bajarê ku hevjînê we lê ye qeyda xwe bikin. Dibe ku bajarên satelîtê yên ku serlêdanan qebûl dikin di heyama ku hûn ketine welêt de hatine guhertin. Ji ber vê yekê, beriya ku hûn bikevin welêt dê fêr bûna we ya ka kîjan bajarên satelîtê qeydkirinê qebûl dikin dê bo we alîkariyekî baştirîn bide. Ger serlêdan hîn jî li bajarê ku hevjîna we lê dimîne de tên pejirandin, hûn dikarin li heman bajarî xwe qeyd bikin.

## 8 LÊKOLİNA NAVNÎŞANÊ Çİ YE?

Lêkolîna navnîşanan pêvajoyek e ku ji hêla Wezareta Karên Navxweyî, Midûriyeta Rêveberiya Koçberiyê ve, ji bo rastkirina navnîşanên penaberên ku li Tirkiyeyê bi statuya parastina demî dijîn re tê rêvebirin. Penaberên ku navnîşana xwe guherandine û navnîşana xwe ya nû ji Îdareya Koçê ya Bajarê re ne ragihandine, divê herî dereng di nav 90 rojan de agahiyên navnîşana xwe nûjen bikin. Ev pêvajo di hefteya ewil a Çileya 2022'an da bi hevkariya polês û cendirmeyan ve dest pê kir û navnîşanên qeydkirî tên ziyaretkirin da ku bê kontrolkirin ka penaber li van navnîşanan de dijîn an ne. Kesên ku navnîşanên xwe nûjen nekin dibe ku bi cezayên cuda yên îdarî re rû bi rû bimînin. Ev pêvajo ji bo biyaniyên xwedî statuya parastina demî, bajarên ku li Tirkiyeyê hatine destnîşankirin, derbas dibe. Ev tê kirin ji bo ku ew erka xwe ya agahdariyê rûniştina bajaran û erkên xwe yên agahdarkirina guhertinên di agahdariya nasnameyê de wekî peywîrekî bicîh bînin.

## 9 EZ PENABER İM, EZ DİXWAZİM DEST PÊ PÊVAJOYA GUNCANÎ YA ZAYENDÎ YÊ BİKİM. GELO Lİ TİRKİYEYÊ MAFEKÎ MİN WİSA HEYE?

Mafê her penaberekî ku li Tirkiyeyê dijî, mîna her welatiyê ku li Komara Tirkiyeyê dijî, mafê pêvajoya entegrasyona zayendîtî bimeşîne heye. Ji bo destpêkirina pêvajoya guncanî ya zayendî, divê pêşî li Tirkiyeyê rûniştina qanûnî hebe û di bin Parastina Demî an jî di bin Parastina Navneteweyî de bin. Eger yek ji van tine be, hûn dikarin bi pasaporta xwe û belgeyeke fermî ya ku îspat dike ku hûn bi awayekî qanûnî li Tirkiyeyê dimînin dest bi vê pêvajoyê bikin. Wekî din, divê hûn ji 18 salî mezintir bin û ne zewicî bin.

Ji bo ku hûn pêvajoya veguhertina zayendê bi fermî dest pê bikin, divê hûn doza "Destûra Guherîna Zayendî" vebikin. Piştî dosyaya eleqedar hûn ê ji aliyê dadgehê ve ji bo nexweşxaneyeke bi "Meclîsa Nasnameya Zayendî" werin şandin. Piştî ku hûn biçin nexweşxaneyê, dê pêvajoya çavdêriya psîkiyatrîkî dest pê bike. Pêvajoya çavdêriya derûnî bi gelemperî di navbera 6 meh û 2 salan de berdewam dike. Piştî vê pêvajoyê, hûn ê ji Endokrinolojiyê re bêne şandin ji bo ku hûn hormonan bikar bînin. Piştî ku pêvajoya çavdêrî û nirxandina we bi dawî bû, dê rapora tenduristiyê ji we re were dayîn. Pêdivî ye ku hûn raporta têkildar pêşkêşî dadgehê bikin û dadgeh dê derbarê guhertina zayenda we de biryarek bide.

## 10 GELO EZ DİKARİM BÊYÎ TEMAMKİRİNA PROSEDURÊN BİJÎJKÎ YÊN Jİ BO GUHERTİNA ZAYENDÊ NAVÊ XWE BİGUHERİM?

Ji bo vekirina doza guhertina navî, ne hewce ye ku operasyonên bi pêvajoya lihevhatina zayendî re têkildar bin. Dadgeha Destûra Bingehîn bi biryara xwe ya 27ê Çileya 2021ê û bi serîlêdana jimara 2018/3434an, pêkanînên cuda asteng kir û pêwîstiya operasyonê wek binpêkirina mafê rêzgirtina jiyana taybet nirxand. Ji ber vê sedemê, hûn dikarin bêyî ku di derheqê pêvajoya lihevhatina zayendî de an jî destpêkirina prosedûra qanûnî de ti operasyonan bikin, doza guhertina navan vekin.

# 11 EZ Dİ BİN BİNÇAVKİRİNA ÎDARÎ DE MAM, GELO EZ DİKARİM Çİ BİKİM?

Ger hûn di bin binçavkirina îdarî de bin û di bin xetera dersînorkirinê de bin, tê wî wateyî ku hûn di bin hin şert û mercan de di vê pêvajoyê de ne. Di nava van şert û mercan de rewşên weke hebûna metirsiya revê, binpêkirina rêgezên ketin û derketinê yên Tirkiyeyê, bikaranîna belgeyên sexte, di dema diyarkirî de derneketina ji Tirkiyeyê, an jî tehdîdkirina nîzam/ewlehî/tendurustiya giştî hene. Dema binçavkirina îdarî ji şeş mehan derbas nabe, lê ji ber hin sedeman dikare şeş mehên din jî were dirêj kirin. Di vê pêvajoyê de berdewamiya biryara binçavkirina îdarî her meh ji aliyê walîtiyê ve tê nirxandin û encam ji we re tê ragihandin. Mafê te heye ku li dijî biryara binçavkirina îdarî îtîrazê bikî, lê ev pêvajoya îtîrazê binçavkirina we ya îdarî narawestîne û biryara dadgehê ceza ya aştiyê jî misoger e. Lê belê di dema binçavkirina îdarî de hûn dikarin dîsa serî li dadweriya cezayê ya aştiyê bidin û daxwaza rakirina biryara binçavkirina îdarî bikin. Dema ku hûn di bin binçawkirina îdarî de ne, hûn dikarin ji mafên bingehîn ên ku ji hêla Destûra Bingehîn û Peymanên Navneteweyî ve hatine parastin sûd werbigirin. Di nav van mafan de mafê agahdarbûn, gihandina parêzer û doktor, agahdarkirina malbat an kesên din, wergirtina serdankeran, çûyîna dadgehê û ger hewce be, tezmînat jî heye. Ji bo ku hûn van mafan bikar bînin û pêvajoya xwe birêve bibin, girîng e ku hûn rewşa xwe baş fam bikin û dema ku hewce be piştgirîya qanûnî bistînin. Ji bo bêtir agahdarî û piştgirî, hûn dikarin bi rayedarên têkildar an jî rêxistinên têkildar ên ku alîkariya qanûnî pêşkêş dikin re têkilî daynin.

## 12 ALÎKARİYA QANÛNÎ Çİ YE Û Jİ BO ALÎKARİYÊ EZ DİKARİM BİÇİM KUDERÊ Jİ BO ALÎKARİYÊ?

Alîkariya hiqûqî tê wateya pêşkêşkirina xizmetên hiqûqî yên bêpere ji aliyê baroyan ve ji bo kesên ku nikarin heqê parêzer û lêçûnên din ên dadgehê bidin. Wekî kesekî penaxwaz an jî penaber, mafê we heye ku serî li baroya bajara xwe bidin û ji bo pirsgirêkên qanûnî yên ku hûn pê re rû bi rû bibin daxwaza alîkariya hiqûqî bikin. Hûn dikarin arîkariya qanûnî werbigirin eger hûn li gorî nirxandina kesane ya ji aliyê baroyê ve guncan werin dîtin. Hûn dikarin ji arîkariya hiqûqî ya ku ji aliyê Daîreyên Alîkariya Hiqûqî yên girêdayî baroyên li Tirkiyeyê ve tên pêşkêşkirin, sûd werbigirin.

Dozên ku li dijî biryarên îdarî yên wekî astengkirina sîgorteya tenduristiyê, dersînorkirin, binçavkirina îdarî, redkirina serlêdanên parastina navneteweyî, paşvekişandina serîlêdanê an jî biryarên nepejirandinê, û her weha dozên di çarçoveya qanûnên medenî de (wek hevberdan û binçavkirin), qanûna kirê, hiqûqa bazirganî û zagona kar ji bo dozên din alîkariya hiqûqî heye. Hûn dikarin ji bo dozên ku li dijî biryarên îdarî hatine vekirin (di nav de redkirina serlêdana parastina navneteweyî, paşvekişandina serîlêdana parastina navneteweyî, biryara dersînorkirinê û biryara binçavkirina îdarî jî te da) û dozên din (wek doza hevberdanê û doza kirêkirinê) alîkariya hiqûqî bistînin.

Hûn dikarin li ser malpera Yekitiya Baroyên Tirkiyeyê (TBB) xwe bigihînin agahiyên têkiliyên hemû baroyan.

Alîkariya hiqûqî jî dikare ji dadgehan were xwestin. Ger kesek di daxwaznameya xwe ya îtîrazê de sedemên daxwaza xwe ya alîkariya hiqûqî bi zelalî diyar bike, dadgeha peywendîdar dê daxwazê binirxîne û di çarçoveya sîstema alîkariya hiqûqî de dê biryara tayînkirina parêzerê bide. Di dozên cezayan de, dadgeh di hin rewşan de dikare rasterast û bêpere parêzerekî tayîn bike.

Komeleya HEVÎ LGBTI+ jî ji penaberan re şêwirmendiya qanûnî peyda dike û dikare we agahdar bike li ser prosedurên arîkariya qanûnî ku ji hêla baroya bajara we ve tên pêşkêş kirin.

## 13 EZ RASTÎ TUNDİYÊ HATİM, EZ DİKARİM Çİ BİKİM? EZ DİKARİM Bİ KÊ RE TÊKİLÎ DAYNİM AN JÎ SERLÊDAN BİKİM?

Ger hûn rastî tundiyê hatibin, wekî gava yekem hûn dikarin serî li yekîneya polîs an jî cendirmeyan bidîn an jî rasterast serî li dozgeriyê bidin; Her du jî mecbûr in ku werin alîkariya we. Ger êrîşeke fizîkî li we hat kirin, hûn dikarin ji servîsên acîl ên nexweşxaneyê alîkariyê bistînin û bi doktorê xwe re têkilî daynin da ku raporekî êrîşê an jî tundiyê bistînin. Girîng e ku nîşaneyên li ser laş ji bo tespîtkirina çalakiya tundiyê belge bikin. Di dozên destdirêjiya zayendî de, rapor ji bo îspatkirina bûyerê girîng in; Ji ber vê yekê, heke gengaz be, divê piştî bûyerê paqijkirina kesane neyê kirin û cil bêne hilanîn. Wekî din, dermankirinên pêşîlêgirtinê dikarin li dijî xetera enfeksiyonê bêne girtin. Di dema îfadeyê de divê polîs an jî cendirme îfadeyên şahidan bigirin. Ger di dema danasînê de astengiyek ziman hebe, hûn dikarin wergêrek bixwazin. Piştrast bikin ku danasîna we rast û bi tevahî hatî tomar kirin û kopiyek jê bistînin. Ger ewlehiya jiyana we di xetereyê de be, hûn dikarin parastinê ji rayedarên têkildar bixwazin. Li gorî Qanûna Cezayê ya Tirk, ji ber ku sûcê destdirêjiya zayendî sûcek e ku herî kêm ji binî 5 salan zêdetir cezayê girtîgehê jê re tê xwestin, divê ji bo her qonaxên qereqol, dozgerî û dozgeriyê parêzerek ji baroyê têkildar were tayînkirin. Dadgeh ji bo piştgiriya hiqûqî û psîkososyal hûn dikarin ji rêxistinên sivîl ên wekî Komeleya HEVÎ LGBTI+ alîkariyê bigirin. Di vê pêvajoyê de, girîng e ku hûn ji kar û barên piştgirî û şêwirmendiyê yên têkildar sûd werbigirin da ku hûn mafên xwe bizanibin û gavên pêwîstî biavêjin.

Di heman demê de kêrhatî ye ku hûn hejmarên girîng ên ku hûn dikarin bigihîjin 24/7 bi bîr bînin.
.ALO 183, Xizmet ji Xeta Şêwirmendiya Civakî ya Malbat, Jin, Zarok û Astengdaran bi Tirkî, Kurdî û Erebî tê wergirtin.
·ALO 155, Polîsê Lezgîn an jî
·ALO 156, Bi telefona Alîkariya Cendirmeyan dikare rapor bê çêkirin û piştgirî were xwestin.
·ALO 112, Alîkariya tenduristiyê ya lezgîn, polîs, cendirme, cerdevaniya qeraxê û îtfaiyeyê bi rêya Navenda Banga Lezgîn a bi Tirkî, Îngilîzî, Erebî, Almanî û Rûsî dikare were peyda kirin.
·ALO 157 YİMER/Navenda Ragihandina Biyaniyan bi Tirkî, Îngilîzî, Erebî, Farisî, Rûsî, Almanî û Peştoyî tê peydakirin.
·Dema ku sepana mobîl a KADES a ji bo Piştgiriya li dijî tundiya li ser jinan a bi tirkî heye, li ser têlefonê tê sazkirin, bi yek klîkekê hûn dikarin xwe bigihînin ALO 155 Polîs.
·Piştgiriyek jî dikare ji Xeta Alîkariya Tundiya Hûndir a Malbatî li ser jimara 0212 656 96 96 were wergirtin.

# PİRSÊN KU TİMÎ Dİ QADA HİQÛQÎ DE Jİ BO PENABERÊN LGBTÎ`YAN TÊN PİRSÎN

hevilgbtidernek

hevilgbti

hevilgbt

hevilgbti.org

info@hevilgbti.org
hukuk@hevilgbti.org

HÊVÎ LGBTÎ

Ev pirtûk ji navbeynkariya Rêxistina Bexşê ya Demokrasiyê ya Ewropayê ve hatiye amadekirin. Berpirsiyariya naverokê bi tevahî girêdayî Komeleya HEVÎ LGBTI+ ye û nêrînên Rêxistina Bexşê ya Ewropî ji bo Demokrasiyê nîşan nade.

EUROPEAN ENDOWMENT FOR DEMOCRACY